**Zanyarî derbarê alîkariyên têkildarî mafê mayînê (Îqamet) ji ber erdhejên li Tirkiye û Sûriyê**

Bandorên erdhejan li Tirkiye û Sûriyê wehşetnak in.
 Ji ber vê yekê piştevaniya bilez û berdewam ji kesên ziyandîtî ji ber bandorên xembar ên van erdhejan ji bo Wezareta Zarok, Xort, Malbat, Beranberî, Koçberî û Entegrasyonê babeteke girîng e.

 Çaverêtî heye ku zanyariyên xwarê ji bo venihêrîneke kurt a bilez li ser guherîn û bijardeyên niha alîkar be:

**<u>Ji bo kesên ku liu navçeyên ziyandîtî dimînin</u>**

**Danûstandin di navbera hikûmeta federal û eyaletan**
Di esas da divê ev yek were berçavgirtin ku ji bo hatina welatiyên Tirkiye û Sûriyê bo kewşena federal hebûna vîzayekê pêwîst e. Ji bo karûbarên vîzaya kesên ku li derveyî Almanyayê dijîn, nûnertiyên bi desthilata tam ên Wezareta Karên Derve li derveyî welêt û di encamê da Hikûmeta Federal berpirs inj.
Wezareta Zarok, Xort, Malbat, Beranberî, Koçberî û Entegrasyonê li eyaleta Nordrhein-Westfalen’ê û eyaletên din bi awayekî nêzik digel hikûmeta feedral bijardeyên piştgiriyê vedikolînin.
Wezareta Karên Derve bi hevkariya Wezareta Federal a welêt û niştîmanê di rewşa hebûna hin şert û mercên pêwîst da (bi taybet: Ziyandîtina kesane ji erdhejê, wek mînak bêmalbûn di demeke gelekî nêzik da; endamê malbatê ku li Almanyayê dijî, soznameyek raber kiriye) pêvajoyeke hêsankirî û pratîkî ji bo wergirtina vîzayê hevaheng kiriye.
 Tu dikarî zanyariyên zêdetir li beşa <u>Pirsên Herî Nasyar</u> a Wezareta Karên Derve li malpera xwarê bibînî:
https://www.auswaertiges-amt.de/de/aussenpolitik/krisenpraevention/humanitaere-hilfe/erdbeben-tuerkei-syrien-faq/2581294

**Yekemayetiya raberkirina soznameyan**
Ji bo pêkanîna pêvajoya pêwîst a wergirtina vîzayê, raberkirina soznameyekê ji aliyê kesê ku li Almanyayê dijî, bo Rêveberiya Hemwelatiyên Derveyî ya navçeyê pêwîst e. Kesê ku li Almanyayê dijî, di çarçoveya soznameyekê da piştrast dike ku lêçûnên pêkhatî yên muhtemel wek mînak ji bo lêçûna debara jiyanê an pereyên nexweşiyê ji bo kesê ku ji Tirkiyê tê, qebûl dike.
Ji bo lezandina vê pêvajoya Wezareta Zarok, Xort, Malbat, Beranberî, Koçberî û Entegrasyonê ji rêveberiyên welatiyên derveyî lo Nordrhein-Westfalen’ê di çarçoevya destûrekê ji bo hesaskirinê daxwaz kiriye ku daxwazên têkildarî raberkirina soznameyekê ji bo kesên ku dixwazin ji navçeyên ziyandîtî derbasî welêt bibin, di yekemayet û rêza herî pêşîn da dayîne.
Ji bo îmkana pêkanîna vekolandina heta radeyan pêkan bilez û berdewam a soznameyê, divê di dema raberkirina soznameyê da hemî belgename (nemaze fatûreyên hiqûqî) bi tam bên radestkirin. Ji bo pirsên zêdetir ên muhtemel, nemaze eva ku çi belgenameyên din hewce ne, Rêveberiya Welatiyên Derveyî bi meyl û meraql li ber destê te ye.
 Tu dikarî hûrgiliyên têkilîdanînê yên Rêveberiya Welatiyên Biyanî ya berpirsa xwe bi alîkariya malpera xwarê wergirî:
https://bamf-navi.bamf.de/de/Themen/Behoerden/

**Ji bo kesên di kewşena federal da**

**Dirêjkirina Vîzayên Schengen**

Wezareta Zarok, Xort, Malbat, Beranberî, Koçberî û Entegrasyonê li Nordrhein-Westfalen’ê di çarçoveya destûrekê da ji bo hesaskirinê daxwaz kiriye ku derbarê kesên ku vîzayeke taybetî serdaneran di dema niha da li kewşena Federal dimînin û piştî derbasbûna dema derbasdariya vîzayê diviyabû vegeriyana navçeyên erdhejê, bi hêsankarî derfeta dirêjkirina heyama vîzaya taybetî serdaneran bêyî rêzikên îdarî bi kar bînin.
Ji bo daxwaza dirêjkirina di demê da ez dixwazim ji we bixwazim ku di dema herî zû da digel Rêveberiya Welatiyên Derveyî ya berpirs bikeve têkiliyê.